Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1019 | 4-Kanûn- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Sewtên li gel bayî ...

**Axir, di dawiya dawîn de sewta li gel bayî qelibandina sînoran bû, ew sînorên ku di dilê xaka welatê dengbêjan de hatibûn xêzkirin. Sewta wan a li gel bayî sînor nas nedikirin, dengê wan nexşerêyek diresmand ji welatê parçebûyî re. Ma kî dikaribû sewt û bayî, dîl bigire?**

"Feleka me xayîn e gidî me dixapîne
Narevîne hey delalê..."*
Wey dil, wey dil, wey dil…

Feleka wan xayîn bû ew dixapandin û bi wan re li hev nedikir!
Ji lewma wan jî "berê xwe dida oxirê û pişta xwe dida felekê" û bi sewta xwe hêrsa bayî kedî dikirin. Bi zimanê bayî digotin û ew tim siwarê bayî dibûn. Ev ba carna dibû hespekî çargavî û carna dibû hespekî kihêl, ma ne jixwe "Kihêl di bin mêrxasan de dibeziyan"…û jixwe ji wan mêrxastir kêm kes hebûn. Devê wan li guhê bayî bû û pistepista wan bû. Tenê wan dikaribû bi zimanê bayî biaxivîn. Ma ne ew dengbêj bûn. Li seranserê welat digeriyan û sewta wan hatibû nivisîn…Nivîs û kitêb paşê, hêdî hêdî hatin bi hewara wan ve. Ji lewre li vî welatî deng û ba pîroz bûn. Ji ber ku sewta dengbêjan a li gel bayî, bîra civakekê ji nû ve zindî dikir. Li welatê wan dijminên ´bîr´an hebûn.

**Her portreyek bîr û baweriyek e**

Ji lewre, her portreya dengbêjekî/ê bîr û baweriyek e. Her portre sewteke li gel bayî ye, sewteke di hedê xwe de. Her portreyek felekeke dijwar e. Her portreyek serpêhatiyeke dîrokî ye. Her portreyek, sirgunê kilamên bêcih û war e. Her portreyek li xerîbiyê nasnameyek û li sînoran pasaportek e. Her portreyek, parçeyek ji wê parçebûna Kurdistanê ye. Lê dîsa jî tenê ew bûn "ne hêsîrê zeman, siltanê herwext"** û li ser wext bûn.

**Dengbêj ansîklopediyên zindî ne**

Ji bo vê axa ku lê her tişt zû tê jibîrkirin (didin jibîrkirin) her dengbêj ansîklopediyeke zindî ye. Her kilamek



olan dida li deşt, gelî, çiya û baniyên Kurdistanê.

**Deng ba bû. Ba deng bû.**

Dengbêj dengê bayî bûn. Ew bayê feleka xayîn. Feleka ku timî ew dixapandin!
Ba pîroz bû li welatê wan, lê dengbêj pîroztir bûn li ber dilê Kurdistanê.
Ba bi hêz bû, lê dengbêj bi hêztir bûn di bîra welatê xwe de. Wan ji kaniyên welatên xwe av vedixwarin û serpehatiyên li welatê xwe dianîn ziman.

**Weke kaniyên biharê bûn**

Bi ber bayê dilê welatê xwe ketibûn. Dengên bayî derdixistin. Kul û keserên xwe tenê ji bayê re digotin. Evîn û hesreta xwe, gilî û gazinên xwe li pişta bayî siwar dikirin û ew daf didan ber bi asoyên welatê xwe ve, ew welatê ku ji sînoran ava bûbû. Ew pif dikirin ewrên xemgîniyê û asîmanê çarenûsê zelal dikirin. Lê ax! Wê felekê timî ew dixapandin, timî…! Wan tenê bi bayî re li hev dikir. Bîra Kurdan ya miçiqî bi saya wan sewtên li gel bayî dol digirt. Tenê li welatê wan dîrok, bi sewta bayî rûpelek ji dîroka Kurdistanê ye, ya ku bi sewta dengê wan hatiye nivîsandin. Her dengbêj çavkaniyeke bê ser û bin e, serkaniyek e; zêyek e. Kî vexwaribe çengek av ji wan kaniyên ku di biharan de teqiyan, heta hetayê bîra hin tiştan dibe li welatê xwe. Tîna xwe bi ava kaniya wan bişikînin û li sewta wan a li gel bayî bihizirin. Bê ka ji bayî re çi dibêjin, ji ewrên reş reş re ewên ku li ser serê me dimeşin, çi nameyê rê dikin? Hela wan bibihîzin, bê ka akorta dîroka me ya xerabûyî bi çi awayî rast dikin û harmoniyeke çawa li hev tînin bi sewta dengên xwe.

**Hey dil!**

Em xwe nexapînin, lê ji bo reşika çavên wan felekê bixapînin û bi dengbêjan re li hev bikin û guhê xwe bel bikin ji bo ku em sewta wan ya li gel bayî bibihîzin. Kî dizane, belkî em jî fêrî zimanê bayî bibin? Kî dizane belkî feleka xayîn me birevîne…
*Ji kilama "Lawikê Metînî" ya Kerabetê Xaç
**Hevokek ji helbesta Arjen Arî ye.

# Helbestvan û jinên berxwedêr ên Efxanistanê

**Serdema Mîr Ebd El-Rihman Xan (1840-1901), ji bo gelê Efxan, nexasim jî ji bo jinan serdemeke tarî bû.**


Mîr Ebd El-Rihman bi piştgiriya Ingilîstanê derket ser textê desthilatê. Mîr Ebd El-Rihman gelek sûc kirin, di nav de îmzekirin û pejirandina Xeta Durand bi Hindistana Brîtanî re. Êrişî Loristanê kirin. Ji ber ku ew ne Misilman bûn ji warên wan re digotin " Kafiristan". Jixwe, wan bi êrişên xwe gelên Basanî jî neçar hiştin ku bibin Misilman. Her wiha Mîr Ebd El-Rihman fermana gelek Hazarayiyan jî dabû û ew jî qetil kirin.

**Şêrîn û 40 jinên berxwedêr**

Dema hêzên Ebd El-Rihman Xan ji bo qirkirina Hazarayiyan êrişî Uruzganê kir, zarok, ciwan û kesên temen mezin qetil kirin, mal şewitandin û tecawizî jinan kirin. Wê demê jina bi navê "Şêrîn" bi 40 jinên din re li dijî van sûcan hemûyan sekinî. Piştî serketina hêzên Ebd El-Rihman Xan ev jin neçar man bi peyatî biçin Kabîlê û xwe bispêrin çiyayên Kabîlê da ku xwe ji hêzên Ebd El-Rihman Xan biparêzin. Lê hêzên Ebd Rihman Xan, dev ji wan bernadin û ew jî li pey wan hilkişiyan serê çiyê. Şêrîn û hevalên wê bi şev û roj bi keviran parastina xwe kirin, lê di dawiyê de bi ser neketin. Dema van jinan dît ku dijmin nêzî wan dibe, neçar man xwe ji kendalên çiyê bavêjin. Piştî ku desthilatdariya zalim a Ebd Rihman Xan hat rûxandin, navê vî çiyayî kirin "Çiyayê Çil Keçan".

**Helbestvana sirgunbûyî, Sîra Bedexşî**

Sîra Bedexşî ango Bîcom Nesab yek ji helbestvanên serdema Mîr Ebd El-Rihman Xan e, Ew sala 1876'an li Bedexşanê ji dayik bûye û sala 1963'an jî rehmet kiriye. Di şazdeh saliya xwe de wê dest bi nivîsandina helbestan kir. Ebd El-Rihman Xan bavê wê ku yek ji mîrên Bedexşanê bû, sirgunî Qendeharê kir. Sîra Bedexşî jiyana xwe li sirgûnê bi malbata xwe re derbas kir.
Sîra Bedexşî nameyek ji Mehcûba Hiravî re şand û tê de behsa êşa wan a hevpar a zexta mêran a li ser jinan kir. Sîra Bedexşî di helbestên xwe de behsa êş û azarên gel û neheqiya Mîr Ebd



El-Riham Xan kir.

**Nimûneyek ji helbesteke "Muxebeia" (veşartî) ya Sîra Bedexşî:**

"Destê ku alîkariyê nade stû û çavê kor yê ku şahiyê nabîne dişikînim
Sed bihar derbas bûn û her kulîlk li cîhekî din hat çandin."

**Bi salan di hucreya yekkesî a kevirî de**

Bîbî Sincî ango Meryam sala 1864'an ji dayik bû. Bavê wê ku bi navê Baba Xazî tê nasîn, di Şerên Yekem û Duyemîn ên Ingilîstan-Efxanistanê de yek ji rêberên şer bû. Bîbî Sincî di helbestên xwe de tawanên Mîr Ebd El-Rihman Xan eşkere kir û ev yek bû
sedem ku bi fermana Ebd El-Rihman Xan wê bişînin girtîgehê. Ebd El-Rihman dengbêjî, zanîn û hişyariyê wek asteng dihesiband û ditirsiya ku Bîbî Sincî di zindanê de jinan fêrî xwendinê bike û bibe sedema pirsgirêkeke din ji bo hikûmeta wî, lewma ferman da ku wê di hucreya yekkesî de bihêlin. Serokê girtîgehê bi fermana Ebd El-Rihman Xan di nav sê rojan de li devereke dûr a bajarê Kabîlê odeyeke kevirî ava kir û Bîbî Sincî xist wê odeyê. Hevjînê Bîbî Sincî ku di dadgehê de dixebitî, ji bo hevjîna wî bê efûkirin çû cem Ebd El-Rihman Xan û daxwaza serbestberdana wê kir û piştî demeke dirêj Bîbî Sincî ji girtîgehê hat berdan. Navê wê li du navçeyên li Kabîlê hatiye kirin.
JÎNHA

Sudoku:Pirs 29

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 6 | 2 | 3 | | 1 | 9 | | |
| | | | | | | | | 2 |
| 4 | 7 | | | 2 | | | 5 | 3 |
| 7 | 2 | 5 | | | 3 | | | |
| | | | | 6 | | | | |
| | | | 2 | | | 3 | 7 | 1 |
| 6 | 1 | | | 3 | | | 2 | 7 |
| 9 | | | | | | | | |
| | | 4 | 5 | | 7 | 8 | 6 | |

Sudoku: Bersiv28

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 2 | 4 | 3 | 1 | 7 | 8 | 6 | 9 |
| 3 | 1 | 7 | 6 | 8 | 9 | 4 | 5 | 2 |
| 8 | 9 | 6 | 4 | 2 | 5 | 1 | 3 | 7 |
| 2 | 8 | 1 | 9 | 3 | 6 | 5 | 7 | 4 |
| 4 | 6 | 5 | 8 | 7 | 2 | 3 | 9 | 1 |
| 9 | 7 | 3 | 5 | 4 | 1 | 6 | 2 | 8 |
| 7 | 5 | 8 | 1 | 9 | 3 | 2 | 4 | 6 |
| 6 | 4 | 9 | 2 | 5 | 8 | 7 | 1 | 3 |
| 1 | 3 | 2 | 7 | 6 | 4 | 9 | 8 | 5 |



## NPG'ê peyameke pîrozbahiyê weşand

Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) bi peaymekê hemû fermandar û şervanên ku tevlî Pêngava Şoreşgerî ya Cenga Xabûrê ya Şehîd Savaş Maraş bûne û ked dane, pîroz kir. ***R-3***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1019 | 4-Kanûn- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# DIRÛTIYA HÊZÊN NAVNETEWEYÎ CAREKE DIN EŞKERE BÛ

Tê zanîn ku bê erêkirina hêzên navneteweyî  bi taybet DYA û Rûsya, dewleta dagirker ya Tirkan nikare êrîşî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bike. Her wiha di civîna dawî ya Konseya Ewlekariyê ya (NY) de hemû endamên konseyê êrîşên dewleta Tirkan rexne kirin. Dirûtiya hêzên navneteweyî careke din eşkere bû, hem di binre êrîşên dewleta Tirkan erê dikin û heta demekî helwestekê jî nîşan nadin û hem jî di civîna Konseya Ewlekariyê de êrîşên dewleta dagirker ya Tirkan rexne dikin.



## Xwepêşandanên Rojhilatê Kurdistan û Îranê didomin

Ji bo piştgirîdayîna serhildana gelên Îranê, jinên Belûçistanê xwepêşandanek li dar xistin û dirûşmeya `JIN JIYAN AZADÎ` bi yek dengî avêtin. ***R-3***

Dayikên Aştiyê: Em ê li hemberî dagirkerî û dorpêçê bisekinin ***R -2***

## 'Li hemberî êrîşan em ê asta têkoşînê mezin bikin'

Endamê rûsipiyên eşîran yên herêma Efrînê Hecî Mistefa diyar kir ku êrîşen dewleta Tirk ya dagirker tevayiya gelên herêmê dike armanc û got, li hemberî êrîş û planên qirkirina gelan emê asat têkoşînê mezin bikin û dagirkeran têk bibin. ***R-5***

'Dewleta Tirk, ne bi tenê herêmê lê dixwaze Sûriyeyê gişî bixe destên xwe' ***R-4***


Ahmed Aktaş
Durûtiya DYE û Rûsyayê
*R-5*


Idrîs Henan
Ji Bakur û Rojhilatî Sûriyê ......
*R-5*


Farûk Sakik
Siyaseta dij-Kurd a dewleta Tirk
*R-4*


Hafiz Ahmet Turhalli
PARASTINA XAK U GEL FERZE
*R-6*

## 'PKK hêviya gelên azadîxwaz e'



Welatiyê Efrînê yê bi navê Mihemed Elî diyar kir ku PKK li ser xeta Şehîdan meşiya, bi têkoşîna ku daye û bi geşedanên ku afirandiye, ne tenê ji bo gelê Kurdistanê, ji bo gelên Rojhilata Navîn û jinên cîhanê bûye hêviya azadiyê. ***R-4***

## Kargeha Gazê ya Siwêdiyê dê demeke nêz de bikeve xizmetê



Rêveberê kargeha Gazê ya Suweydiyê Egîd Ebdulmecîd diyar kir ku ew hewl didin kareghê ji nû ve çeksaz bikin û cihên ku ji ber êrişên dagîrkeriyê zirar dîtine  sererast bikin, da ku pêwîstiya gel ya gazê peyda bikin. ***R-6***

## 'Li hemberî êrîş û dorpêçê em xwedî piroje û helwestin'



Hevseroka Tevgera Çand û Hunerê a herêma Efrînê Newroz Silêman da xuyakirin ku êrîş û dorpêça li ser herêmê bandoreke neyênî li ser xebatên hunrî dike û got, tevî hemû zehmetiyan jî em ê pirojeyên xwe dewam bikin. ***R-7***

# Erzîncan: Divê jin hîn bêhtir têbikoşin

**Endama Koordînasyona KJK'ê Besê Erzîncan destnîşan kir ku jin ji bo felsefeya azadiyê ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan belav bike divê ji her kesî bêhtir bixebitin.**

Endama Koordînasyona KJK'ê Besê Erzîncan beşdarî bernameya Xwebûnê ya JIN TV bû û bersiv da pirsên Arjîn Baysal.

Besê Erzîncan qala têkoşîna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a ji bo azadiya jinê kir û got, “Nêzîkatiya Rêber Apo ya li jinê, hîn ji roja destpêkê ve gelekî bi wêrekî bû. Li cihekî weke Rojhilata Navîn ku di mijara jinê de gelekî dogmatîk û xwedî nêzîkatiyên paşverû ye, bêhn li jinê hatiye çikandin. Piştî Îslamiyetê jî bi navê Îslamiyetê gelekî zext li jinê hate kirin. Bi taybetî li jinên Kurd. Dema ku mirov jineke ji gelekî bênasname be hingî mêtingerî û tunehesibandin bi du qatî giran dibe. Jin mîna bindesta bindestan bû. Rêber Apo di nava civakeke bi vî rengî de bi wêrekî dest bi têkoşîna azadiya jinê kir. Girîng e ku têkoşîna rizgariya neteweyî bê meşandin. Pêwîstiya gelê Kurd bi rizgariya neteweyî hebû, lê belê pirsa ku wê ev rizgarkirin çawa bibe, girîng bû. Li welatekî azad, kolemayina jinê bêguman têkoşîneke rast a azadiyê nebû. Rêber Apo timî dipirsî eger Kurdistan wê azad bibe ev yek wê çawa bibe. Ji bo vê jî analîza ‘Divê çawa bê jiyîn’ destnîşan kir. Armanca bingehîn a Rêber Apo avakirina alternatîfa sîstemê bû. Nêzîkatiya Rêber Apo ji tevgerên şoreşger ên din gelekî bêhtir radîkal bû. Rêber Apo got, ‘Şoreşa me şoreşa jinê ye’.

PKK'ê hîn ji roja destpêkê ve têkoşîna xwe li ser feraseta azadiya jinê meşand, lewma jî civaka ku dixwest ava bike li ser bingeha paradîgmaya civaka azadîparêziya jinê perwerde kir. Kadroyên vê yekê afirand. Eger rêxistiniyeke te tune be tu nikare şoreşê bike. Rêber Apo ji bo vê jî rêxistiniya xweser a jinê ava kir.”

Besê Erzîncan got, “Rêber Apo timî dibêje ‘yên ku divê min herî zêde fêhm bikin û bi cih bînin, jin in’. Vê dibêje, ji ber ku zane ku daxwaza azadiyê ya bi hezaran salî bi jinê re heye. Ev yek jinan bêhtir têkoşer dike. Tola hezaran salî heye ku jin wê ji vê sîstemê hilînin. Ji ber vê yekê jî divê herî zêde jin felsefeya azadiyê ya Rêber Apo belav bikin û ji bo vê têbikoşin. Em jin divê xwe li ber paradîgmaya Rêber Apo perwerde bikin û vê paradîgmayê li nava mirovahiyê belav bikin. Ji her kesî bêhtir ev yek wezîfeya me ye.”

Di dawiya axaftina xwe de Besê Erzîncan got, “Hezkirina Rêber Apo hezkirina Kurdistanê û civakê ye. Hezkirina Rêber Apo mirovan azad dike. Dibe ku hinek di vê mijarê de me rexne dikin, lê belê heqîqet ev e. Felsefeya Rêber Apo ji bo tevahiya mirovahiyê ye.” - ***ANF***



# Dayikên Aştiyê: Em ê li hemberî dagirkerî û dorpêçê bisekinin

**Dayikên Aştiyê yên herêma Efrînê diyar kir ku ew ê li hemberî êrişên dewleta Tirk û dorpêça hikumeta Şamê li ber xwe bidin û van siyasetan têk bibin.**

Bendên kontrolê yên Firqeya Çaremîn a girêdayî hikumeta Şamê dorpêça li ser kantona Şehbayê didomîne, rê nade ku madeyên sereke yên jiyanê, sotmenî û derman derbasî kantonê bibin. Hemwextî vê dorpêçê jî artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê rojane gund û navçeyên kantona Şehbayê topbaran dikin û komkujiyan li dijî şêniyên koçber pêk tînin.

Dayikên Aştiyê yên li Şehbayê destnîşan kirin ku êriş û dorpêç bi armanca têkbirina îradeya wan û koçberkirina wan ji kantonê ne. Dayikên Aştiy anîn ziman ku ev siyaset dê têk biçin.

Fîdan Mihemed a ji Efrînê koçber bûye got: “Em di çadirên naylon de dijîn û rewşa me pir xerab e bi taybetî di vê zivistanê de, ji ber hikumeta Şamê dorpêç li ser me ferz kiriye û li kantonê hêmanên sereke yên jiyanê wekî xwarin û madeyên sotemeniyê tune ne.”

Fîdan Mihemed wiha domand: “Em ji xaka xwe hatin koçberkirin û malên me hatin wêrankirin, lê dîsa jî li hember siyasetên dewleta Tirk a dagirker em li ber xwe didin. Em bang li hikumeta Şamê dikin ku li siyasetên xwe vegere û şêniyên Efrînê wek welatiyên Sûriyê bibîne.

Xedîce Mihemed anî ziman ku ew tevî temenê xwe yê mezin amade ye li hemberî planên dewleta Tirk a dagirker bisekine û got: “Em Dayikên Aştiyê û yên şehîdan in, me hemû tiştên xwe ji dest dan, xak û mala me çûn û em koçberî Şehbayê hatin kirin, lê dîsa jî em ê berxwedana xwe ya li hember dagirkeriya Tirk bidomînin û ez ê bi vî emrî amade bim li hember planên dewleta Tirk a dagirker bisekinim.”

Her wiha, dayika Asye Ebdo jî anî ziman ku ew ê bi hemû rêbazan li hemberî siyasetên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî şêniyên herêma Efrînê yên koçber berxwedanê bidomînin.

Dayika Asye bang li rêxistinên hiqûqî û mirovî kir ku werin herêmê û zehmetiyên şêniyan bişopînin, zextê li hikumeta Şamê bikin da ku dorpêça li ser şêniyan bişkîne û îtîraf bi mafê hemû pêkhateyên gelê Sûriyê yê jiyana wekhev û azad bike.

***ANHA***










# Nerges Mihemedî: Daxwaza gel rûxandina rejîmê ye

**Çalakvan Nerges Mihemedî di nameya xwe de daxwaza piştevaniya taybet ji jinên çalakvanên li Îranê kir û tekezî li ser rola wan ya giring a di pêkanîna demokrasiyê de kir.**



Çalakvana mafên mirovan Nerges Mihemedî ku li girtîgeha Êvînê tê girtin, nameyek ji Yekîtiya Ewropayê re şand û tê de rûxandina rejîmê weke îrade û daxwaza gelê Îranê bi nav kir.

Çalakvana mafên mirovan Nerges Mihemedî di pêyama ku ji Serokatî û nûnerên Parlamentoya Ewropayê yên li Brukselê re şandiye de, wiha got: “Di dema derbasbûna ji sîstema Komara Îslamî de, em dixwazin bigihin sîstemeke ku tê de mafên mirovan bi cih werin anîn. Em hêvî dikin ku bi têkoşîna li dijî zilmê, em dikarin rojekê ji bo aştiya cîhanê bibin yek. Di dema girtina her biryarekê de pêwîst e nêzîkatiya pêkanîna zexta herî zêde li ser rejîmê ji bo bidestxistin û bihêzkirina civaka sivîl û garantîkirina mafên mirovan were berçavgirtin.”

**Avakirina pergalekê demokratîk**

Nerges Mihemedî di pêyama xwe de bal kişand li ser avakirina pergalekê demokratîk û domand: “Ji bo ku sîstemek li ser bingeha demokrasiyê bê avakirin, pêdiviya civakê bi saziyên mafên mirovan ên sivîl ên serbixwe heye. Çalakiya sivîl a çalakvanên tevgerên civakî girîng û bibandor e.”

Di dawiya pêyama xwe de Nerges Mihemedî bang li çalakvanên jin ên Îranî kir ku ji bo pêkanîna demokrasiyê têkoşîna xwe bidomînin û wiha got: “Beriya 29 salan dema ez ketim zanîngehê, min di 12 saziyên sivîl de di warê xebatên xwendekar, jin û mafên mirovan ên civaka sivîl de xebitîm. Ji ber xebata xwe ya sivîl heta niha 13 caran hatim girtin û li pênc dadgehan bi 34 sal zîndan û 154 qamçiyan hatim cezakirin.” - ***JÎNHA***



# ’Li hemberî êrîş û dorpêçê em xwedî piroje û helwestin’

**Hevseroka Tevgera Çand û Hunerê a herêma Efrînê Newroz Silêman da xuyakirin ku êrîş û dorpêça li ser herêmê bandoreke neyênî li ser xebatên hunrî dike û got, tevî hemû zehmetiyan jî em ê pirojeyên xwe dewam bikin.**

**Navenda Nûçeyan/ Şehba**

Êrîşên domdar yên dewleta Tirk ya dagirker û dorpêça hikumeta Şamê yên li ser herêm, banoreke neyênî li ser tevayiya aliyên jiyanê yên welatiyan dike. Ji ber êrişên rojane yên ser herêmê saziyên xizmeguzariyê û tevayiya saziyên herêmê zehmetiyên mezin dibînin. Herwiha dorpêç jî bandoreke mezin dike. Tevgera Çand û Hunerê Jî ji ber êrîşên ser herêmê û ambargoya heyî zehmetiyan di kar û xebatên xwe de dibînin. Lê tevî hemû zehmetiyan jî ew bi biryardarî û moraldayînek xurt xebatê xwe didin meşandin, Herwiha ji bo pêşerojê pirojeyên xwe amede dikin.

Derbarê êrişên dewleta Tirk yên ser herêmê û bandora wan li ser xbatên hunerê hevseroka Tevgera Çand û Hunerê ya herêma Efrînê Newroz Silêman ji rojnameya me re axivî.

**’Armanca êrişên dagirkeriya Tirk têkbirina aramiya herêmê ye’**



Newroz Silêman diyar kir ku armanaca êrîşên dagirkeriya Tirk yên ser herêmê valakirin û dagirkirina herêmê ye û wiha got: “Dewleta Tirk a dagirker bi êrîşên xwe yên domdar yên ser herêmê, hewil dide ku aramî û ewlehiya herêmê têk bibe, herêmê ji gelên wê yên resen vala bike û planên xwe yên dagirkirina herêmê pêk bîne. Dagirker ji bo ku karbin planênên xwe pêk bînin hewil didin tevayiya xebatên Rêveberiya Xweser lawaz û asteng bikin. Yek ji armancên êrîşên dagirkeriyê jî ew e ku lawaziyekê bixin kar û xebatên saziyên herêmê.”

**’Êrîşên dagirkeriyê bandorê li xebatên hunerî dike’**

Newroz anî ziman ku ev rewşa heyî yekser bandorê li ser projeyên wan yên hunerî dike û wiha domand: “Xebatên hunerî ji bo moraldayîn û xurtkirina vîna gel li hemberî êrîşên dagirkeriyê pir girînge. Lê ji ber êrîşên dagirkeriyê em astengiyan di kar û xebatên xwe de dibînin û bernameyên me yên hunerî yên di nava gel de kêm dimînin. Herwiha ji ber dorpêça hikumeta Şamê ya li ser herêm jî, em di peydekirina alavan de zehmetiyan dibînin.”

**’Li hemberî êrîş û dorpêçê em xwedî piroje û helwestin’**



Newroz da xuyakirin ku li hember êrîşên dagirkeriyê ew xwedî helwest û bi îsrarin ku xebatên xwe bi ser bixin û wiha got: “Tu carî tevgera candê nehatiye sekinandin û di cihê xwe de nemaye. Her dem li himberî êrşîan û dorpêçê, em xwedî piroje û helwestin. Tevî hemû zehmetiyên ku em rojane jiyan dikin jî, amadekariyên me yên ji bo pêkanîna proje û derxistina berhemên hunerî yên nû bi hêz dewam dikin. Ti êrîş nikare vîna me bişkîne. Wê berhemên me yên hunerî di demeke nêz de werin pêşkêş kirin. Bila dijmin û tavahiya cîhanê bizanibe ku gelê me vîn û biryardariyeke mezin têkoşîn dike”.

**’ Pêwîste rêxistinên mirovî bi erkê xwe yê exlaqî rabin’**

Hevseroka Tevgera Çand û Hunerê a herêma Efrînê Newroz Silêman banga li rêxistinên mirovî kir ku bi erkên xwe yên exlaqî rabin û wiha qedand: “Her çiqas êrîşên hovane li ser gelê me bê kirin, ewqas berxwedanî û têkoşîna gel jî bilindtir dibe. Em bang tavahî rêxistinên mirovî dikin ku li hember van êrîşan xwedî helwest û bertek bin, herwiha bi erkên xwe yên exlaqî rabin”.

# Destana PKK’ê bi çand û muzîkê hate vegotin

**Koma Awaza Çiya bi fîlmê muzîkal ê bi navê ‘Destana PKK’ê’ behsa dîroka PKK’ê û heqîqeta gerîla kir.**



Koma Awaza Çiya, sala 2020’î dest bi çêkirina fîlmê bi navê Destana PKK’ê kir. Gotin û muzîk ên Awaza Çiya ne. Koro ji 46 kesan pêk tê. Destana PKK’ê bi awayê bass, alto, solo, tenor û soprano hat gotin. Stran, bi tembûr, gîtarê bass, çello, piyano û gelek alavên din ên muzîkê û dîtbarî û aheng li hev, hatin gotin.

Endamên Koma Awaza Çiya Têkoşîn Cûdî û Seyît Riza Silbûs ku birêvebirina projeyê de cih girtine, li ser çima Destana PKK’ê bi awayekê muzîkal vegotine û projeyên xwe axivîn.

Têkoşîna Cûdî, dîtinên bîneran ên li ser Destana PKK’ê wiha anîn ziman: “Me hewil da ku em serdemeke dîroka PKK’ê bi destaneke muzîkal pêşkêşê gel bikin. Destana PKK’ê, wê bi projeya me neqede û her dewam bike. Gelek dîtin hebûn li ser destanê. Hinekan wek belgefîlm, hinekan wek klîb nirxand. PKK gelek rengan vedihewîne û bi vî awayî diafirîne. Me jî Destana PKK’ê bi vî awayî kişand. Di destanê de hem sînema, hem şano, hem helbest hem folklor hem jî klîb hene. Hemû beşên hunerê tê de hene.“

Têkoşîn Cûdî diyar kir ku Destana PKK’ê ji serê dîrokê dest pê dike û bi muzîk û çîrok li ser tê sekinandin û wiha got: “Muzîk li gor dîmenan hat diyarkirin. Her deng li dîmenekê hat anîn. Me sala 2020’î dest pê kir. Armanca me ew bû em di salvegera damezirîna PKK’ê de û sala 2022’yan temam bikin. 46 kesan di nav koroyê de cih girt. Tecrûbeyeke nû û xebateke berfereh bû. Xebateke gelek cuda bû û gelek rengîn bû.“

**Bi derfetên Kêm û di nava şer de hat çêkirin**

Têkoşîn Cûdî anî ziman ku gelek derdor difikirîn ku mirov nikare xebateke wiha bike, derfet kêm in, wê bi profesyonelî qels be û afirîneriya Kurdan heta bi derekê ye. Bi domdarî Cûdî got: “Me di nav bêderfetiyê û şer de xebateke wiha kir. Ya rast bi derfetên kêm tiştên bi berhemdarî çêdibin.“

Cûdî da zanîn ku xebata muzîkê di nav du salan de temam bûye û xebata perwerdehiyê sala 2020’î dest pê kiriye û wiha pê de çû: “Xebat hene ku bi salan dewam dikin û xebat hene ku bi mehan li ber xwe didin. Destana PKK’ê projeyeke berfereh bû. Projeyeke wiha divê dirêjtir bûya lê ji ber dewamkirina şoreşê û keda zêde ya hevalan di demeke kin de temam bû.“

**Di hunera şoreşê de pêşengtî**

Cûdî got ku Şoreş her berdewam, her tim xwe ji nû ve diafirîne, nû û dewlemend dike û ji bo planên pêşerojê yên Awaza Çiya jî ev tişt gotin: “Hunermend şoreşger xwe bi tenê bi mijarekê re mijûl nakin û gavên afirîner diavêjin. Em Awaza Çiya ne bi tenê wek proje, plansaziyên me yên rojane jî hene. Bi Destana PKK’ê me bi dehan bername, klîb û sê albûm çêkirin. Xebata esas Destana PKK’ê bû lê pê re em bi projeyên cuda re jî mijûl bûn. Em ê bi hunera xwe pêşengiya hunerê şoreşê û hunera gel bikin. Armanca me, vejiyandina çand û hunera gele xwe, bi resenî ye.“

**Meşa azadiyê ya 50 salan**

Seyît Riza Silbûs jî da xuyakirin ku di Destana PKK’ê de muzîk û çîrok li pêş in û sedem jî ew e ku muzîk û çîrok di çanda Kurdan xwedî cihekê giring in û got: “Bûyerên li Kurdistanê qewimîne bi awayê gotina çîrokan û muzîkê heta bi niha hatine. Lewma me xwest ku em dîroka PKK’ê jî bi heman awayî bibêjin.“

Seyît Riza destnîşan kir ku Destana PKK’ê ne bi tenê xebateke hunerî ye û wiha dom kir: “Bi Destana PKK’ê me hema wisa di ser re behsa dîroka PKK’ê bi biyografî û kareografiyê kir. Projeya me ya Destana PKK’ê temam bû lê dîroka PKK’ê bi tenê bi xebateke hunerî nayê vegotin.“

Seyît Riza diyar kir ku Destana PKK’ê di nav şer de hatiye kişandin û wiha got: “Me xwe li gor rastiya şer bi rêxistin kir û destan çêkir. Ya rast me ev da ber çavên xwe ku dibe şer biqewime û proje temam nebe lê bi israr me biryar da ku projeyê çêbikin.“

Seyît Riza destnîşan kir ku giring e mirov bi awayekê muzîkal li ser şoreş, jiyana gel û gerîla û rastiya têkoşînê bisekine û axavtina xwe wiha bi dawî kir: “Me anîna ziman ya dîroka PKK’ê û heqîqeta gerîla, têkoşîn û jiyanê bi muzîkê, bi hûnandina bi hunerê ji xwe re kir esas.“ -***ANF***

# Kargeha Gazê ya Siwêdiyê dê demeke nêz de bikeve xizmetê

## Rêveberê kargeha Gazê ya Suweydiyê Egîd Ebdulmecîd diyar kir ku ew hewl didin kareghê ji nû ve çeksaz bikin û cihên ku ji ber êrişên dagîrkeriyê zirar dîtine sererast bikin, da ku pêwîstiya gel ya gazê peyda bikin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Êrişên dewleta Tirk ya dagirker yên li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê pêk tîne, ne nû ne, lê êrişên vê dawiyê bi armanca têkbirina binesaziya herêmê, pêk tên. Ji 19'ê Mijdarê ve, bi awayekî hovane êriş li ser herêmên cûda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewam dikin. Herwiha balafirên şer yên bêmirov yên dagîrkeriya Tirkî nehatine rawestandin. Tirkiyê di êrişên xwe de ne welatî tenê, navendên xizmetê û binsaziya herêmê jî dike hedef.

Di roja 4`an ji êrişên hovanae yên dagîrkeriya Tirkî (23`ê Mijdarê) de dagirkeriyê danê sibehê bi 6 êrîşên hewayî kargeha gazê ya gundê Siwêdiyê ya başûrê navçeya Dêrikê ya Kantona Qamişlo kir hedef û topbaran zêdetirî du saetan berdewam kir. Di encamê de kargeh rawestiya û gaz li seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê û kehrebe jî li herêma Cizîrê qut bû.

Kargeha gazê ya Siwêdiyê çavkaniya sereke ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya gaza malan e, herwiha stasyona derxistina kehrebeyê ya Herêma Cizîrê bi herdû kantonên wê ya Qamişlo û Hesekê ye. Kargeh ji bo herêmê pir girîng e, lewra ji tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê re gaza malan (RBC) peyda dike, herwiha çavkaniya dayîna kehrebê ye û 500 Hezar m3 gaz ji bo bidestxistina kehrebeya herêma Cizîrê dide.

Piştî kar û xebateke zêde ji aliyê kargehên teknîkî yên Nivîsgeha Enerjiyê li herêma Cezîrê ji bo vegerandina elektirîkê, ofîsê 29ê Mijdarê li ser rûpela xwe ya fermî ragihand ku du çavkaniyên gazê ketine xizmetê û bi tora giştî ve hatin girêdan. Herwiha Li gorî ofîsê, tevahiya miqdarê ku niha tê çêkirin dê ji bo xetên xizmetguzariyê yên li herêma Cezîrê werin veqetandin.

Ji bo ku em hê zêdetir rewşa kargehê û tedbîrên wê yên piştî êrişa vê dawiyê ku li ser hatibû kirin nas bikin endezyar û rêveberê Kargeha Gazê ya Swêdê Egîd Ebdulmecîd ji me re axivî û da zanîn ku berî bombebaranê kargehê rojane 16 hezar cereyên gaza malan derdixist û li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê belav dibû.

Egîd diyar kir ku berhemê gazê, ango peydakirina cereyên xazê dê weke berê be û axaftina xwe wiha domand: "Beriya niha miqdareke qaz ji başûrê Kurdistanê ji me re hatibû û niha jî ji me re tê. Ji bo wê jî em ji gazê qut nebûne. Di vê rewşê de em neçar in ku gaza malan ji derve bînin ku



nirxê wê bi 5 caran bilindtir e. Cereyê gazê bi 5 hezar lîre bû. Lê lêçûna anîna wê ji derve 25 hezar lîre ye. Em hewl didin depoya gazê ya li cem xwe ji bo rewşên awarte bihêlin. Tevî ku çereyê gaz bi bihayekî pir bilind tê, lê dîsa jî Rêveberiya Xweser bi bihayekî normal dide welatiyan"

### `Ziyaneke mezin gihiştiye amûrên kargerhê`

Egîd di berdewamiya axaftina xwe de got, niha bandora ku li ser kargehê hatiye kirin ew e ku berhemê derxistina gazê, ziwakirin û sarkirin wê hatiye rawestandin û ziyaneke mezin gihîştiye kablo û amûrên kargehê.

Egîd da xuyakirin ku di rojên derbasbûyî de em weke xebatkarên kargehê, ji bo gihandina gazê ji bo çavkaniyên re me hin veguheztinan pêk bînin. Herî dawî jî xaz ji tevayiya çavkaniyên gazê re hate peydakirin. Lê ev gaz tenê ji bo çavkaniyan e, ji bo malan ne guncawe.

Egîd got, Niha rewşa gazê wek berê ye û divê welatî jî vê yekê bizanibin, da ku nekeve bin bandora çavbirçîtiya bazirgan û belavkeran. Herwiha divê berpirsên pêwendîdar şopandina rewşê bikin da ku gazê bi bihayekî bêserûber neyê firotin.

### `Kargeha Siwêdiyê kargeha sereke ya gazê li bakur û rojhilatê Sûriyê ye`

Egîd derbarê gaza malan de jî wiha got: "Kargeha gazê ya Siwêdiyê ya sereke ku xazê ji bo zêdetirî 4 milyon kesî li tevayiya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê peyda dike. herwiha got, gelek kar û xebat li ser îstasyonên ku gazê didin çavkaniyên gazê hatine kirin û bi xebatên wan yên hevpar hin ji stasyon ketin xizmetê de."



**Hewldanên sereraskirina kargehê**

Egîd da zanîn ku piştî êrişê kar û hewldanên wan yên sererastkirna kargehê zêde bûne û wiha dirêjî da avftina xwe: "Ji bo ku careke din çavkaniyên xazê bikevin xizmetê de, di roja duyem ji bombebaranê me yekser dest bi kar kir. Jixwe armanca me ya sereke dayîna xazê ji çavkaniyên elektrîkê ye. Vê yekê jî xebat û guhertinên taybet li ser xet û amûran dixwest. Me van karan bi dawî kir û gazê da çavkanî û xetên duyem. Herwiha me zirarên ku giştibûn kargehê sererast kirin û me hin amûran peyda kirin. Di dema nêz de emê dest bi xebatê li ser lênêrîna yekîneyên xirab bikin, da ku em bikarin zaza malan peyda bikin. Ev yek jî pêwîstiya wê bi xebateke demdirêj û baş heye. Herwiha peydekirina amûr û parçeyên pêwîst û zêdekirina karmendên kargehê."

### `Emê kargehê vegerînin rewşa wê ya berê`

Egîd bal kişand ser dema pêwîst ji bo sererastkirina kargehê û wiha pê da çû: "Emê çerx û cihên xerabûyî sererast bikin û kargehê vegerînin rewşa wê ya berê."

Endezyar û rêveberê kargeha Xazê ya Siwêdiyê di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Hejmara xaza ku di depoyan de maye xaza LPG ya ji Başûr e, niha mîqdareke baş ji xazê tê peydekirin. Eger rewş baş bibe dê gel nekeve kirîza mezin de."

# Li Herêma Kurdistanê yasaya taybet a mafê karkeran nayê pêkanîn

**Li gorî aktîvîstan li Herêma Kurdistanê pirsgirêka sereke ya karmendên sektora taybet û karkeran nepêkanîna yasayane. Ji vane jî yasaya kar, yasaya malnişîn û ewlehiya civakî ye. Diyar dikin ku herî zêde pirsgirêka karkerên jin hene, ji ber ku li cihê kar rastî şidet û destdirêjiya zayendî tên.**

Çalakvanên Mafên Mirovan û Jinan têkildarî nepêkanîna yasaya taybet a mafên karkerên Herêma Kurdistanê ji Rojnews'ê re axivîn.

Aktîvîstê Mafê Mirovan Helşo Ebdulfeteh têkildarî pirsgirêkên karkeran wiha axivî: "Pirsgirêka herî diyar a karmendên sektora taybet û bi giştî



karkeran hene, mijara nepêkanîna yasayê ye. Ne nepêkanîna yasa kar, yasaya malnişîn û yasaya ewlehiya civakî ye ku peywendiya van yasayan bi kar, karker, saetên kar, peymanên kar û tomarkirina karkeran li navenda malnişîniyê ve heye.

Helşo Ebdulfeteh wiha domand: "Ji ber nepêkanîna yasayan, mijara selametiya pîşeyê karkeran yek ji pirsgirêkane. Her çiqas hikûmet û saziyên girtî timî propagandeya vê yekê dikin ku wê sektora taybet vejînin, lê mixabin di asta pêwîst de nîne û nekarîne saziyên peywendîdar aktîv bikin ku xizmeta karkeran bikin."

Aktîvîstê Mafê Mirovan Helşo Ebdulfeteh têkildarî erkên ku dikevin li ser milê karkeran ku bikarin mafên xwe bi dest bixin jî got: "Pêwîstiye di serî de hişyariya wan li ser yasayê hebe. Ji bo ku bikarin pêşerojê weke karmendên dewletê ji malnişînê sûdmend bin. Herwiha divê sendîkayên karkeran heta karker mafê xwe distînin piştgiriya wan bikin."

Herwiha Aktîvîsta Mafê Jinan Dilsoz Zengene jî têkildarî rewşa giştî ya karkeran û jinên karker wiha axivî:



"Piraniya karkeran têkilarî mafên xwe nehiştiyar in. Divê peymana karker li gel xwediyê kar hebe. Herwiha sîgorteya tenduristiyê yek ji mafên karkerane ku li ber çavan were girtin. Herî zêde pirsgirêka karkerên jin heye. Heta li cihê kar rûbirûyî şidet û destdirêjiya zayendî tên. Sedema vê jî ewe ku mafên xwe nizanin." ***ROJNEWS***



## PARASTINA XAK U GEL FERZE

Hafiz Ahmet Turhalli

Kurd û Kurdistan bi hezarê salan e dibin êrîşên dagirkeran de ne. Welatê me yê Pîroz, hatiye dabeşkirin û gelê me hatiye perçiqandin. Bi taybet kesên ji xwe re dibêjin em bawermendên ola Îslamê ne, xaka me dagirkirine û piştgiriya wan jî hêzên sereke yên li cîhanê desthelatin, dikin. Wek gel, me gellekî êş û azar ji destên dagirkerên xwe kişandiye û em hêjî dikşînin.

Me di dîroka xwede gellekî şaşî kirin e, parastina xakê her çiqasî me pêk anîbe jî, wek gel me bihevre hemû xaka welatê xwe neparastiye. Serhildan çêbune, carna xwebirêvebirin jî çebûye, lê mixabin berdewam parastina xak u gel çênebûye. Hişmendiya parastina xakê, di mêjîyên me de birêkûpêk cîh negirtiye, dabeşkirina xaka me, buye sedem ku, mêjiyê me Kurdan jî parçe û dabeş bibe. Welatê me kirine çar pênc perçe, lê mêjiyên me kirine hezar perçe. Di gotin û karkirinên me Kurdan de, ji bo welat û xak; partî, civak û dezgeyên ji hêla Kurdan ve tên avakirin jî, pêşî li vê perçebunê negirtine û hêjî gelek ji partî û dezgeyên bi navê Kurd û Kurdîstanê kar dikin vê perçebunê didomînin. Wek mînak: Dibêjin Kurdîstana Iraqê, Îranê, Suriyê û Tirkiyê. Di rastiyê de Kurdistan her yeke! Li perçeyek welat qiyamet radibe, perçeyên din li gor pêwistiyê welatperwerî

tevnagerin. Di dîroka me ya dûr de ev bi gelemperî pêş neketiye û di dîroka me ya nêz de jî, ji bilî PKK kesekî bi dengekî bilind û karekî bi rêkûpêk ji bo yekitiya xak û gel bi giştî pêşnexistiye. PKK dijî pêşxistina perçebunê ji bîrdoziya xwe de û karkirinên xwe de, giringiya yekitiya xak û gel, gelekî kar kir. Bi êrîşên DAÎŞ' ê li ser hemû parçeyên xaka pîroz karekî berbiçav hate kirin û xwîna zarokên hemû parçeyên Kurdistanê di heman êniyê de hate rêtin. Ev ji bo xak û gelê me û yekitiya wî bû bingehekî girîng. Tovên yekitiyê ên bihêz hatin çandin, li dijî perçebunê ev tov şîn bûn û ev şînbûn jî berdewame.

Ji ber ku gelên cîhanê yekitiya xak û gelê xwe pêkanîne

serkeftin û dilxweşîya cîhanê dijîn.

Li Başurê Kurdîstanê li navçeya Zaxo henek kesên sivîl û zarok ji hêla dewleta Tirk ve hatin qetil kirin, Ereban qiyamet rakirin. Di Ukrayna û hemû cîhanê de em dibînin ku yekitiya ser xak û gel kare gelek tiştan bi xwe re biguherîne. Duçarbûna zilm û zordariyan ne çarenuse, bi yekitiya gel û parastina xaka pîroz em karin vê çarenusê biguherînin! Neha li Rojava û Rojhelat êrîşên qirkirinê hene, lê ji bo parastina gel û xaka xwe divê em karekî serkeftî pêk bînin. Kesên Misilman dibêjin, ev ne meseleyeke olî ye, belê parastina xak û gel meseleyeke Olî ye û li ser kesê Misilman ferze kû parastina xak û gel bike. Parastina xak û gel li ser hemû Kurdan ferze û bêdeng mayîn heram e. Ev ferza han kê bicîh neyîne li dunyayê rûswatî li axretê jî agirê cehennemê benda wî ye. Qur'an: ‚Ji were destûr hat dayîn hûn karin xwe biparêzin'. (Hec 39) ‚Kesê we ji xaka we derdixe, hun jî wan derxînin, kesê we dikuje hun jî wan bikujin'. (Beqere 191) Belê Êrîşên qirkirinê ser xak û gelê me zêde bune. Neha dema yekîtî û bihevre karkirinê ye.



# NPG'ê peyameke pîrozbahiyê weşand

## Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) bi peaymekê hemû fermandar û şervanên ku tevlî Pêngava Şoreşgerî ya Cenga Xabûrê ya Şehîd Savaş Maraş bûne û ked dane, pîroz kir.

**Navenda Nûçeyan**

ji ber operasyona şoreşgerî ya ku fermandar û şervanên Pêngava Şoreşger a Cenga Xabûrê ya Şehîd Savaş Maraş li dar xistin, Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) peyameke pîrozbahiyê weşand.

NPG'ê di peyama xwe de diyar kjir ku di 25'ê Mijdarê de li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî ya li rojavayê Zapê li dijî dagirkeran ji 7 aliyan û bi gelek taktîkên gerîla yên bi koordîneyî çalakiyeke şoreşgerî ya serkeftî hate lidarxistin û wiha dewam kir: "Di vê operasyona şoreşgerî de ku bi lehengî, şêwazê êrîşê û ruhê fedaî hate lidarxistin de 17 dagirker hatin cezakirin û 10 çeperên dijmin hatin rûxandin."

NPG'ê da zanîn ku di 26'ê Mijdarê de jî ; Li Qada Berxwedanê Girê Hekkarî ya Metîna li dijî dagirkeran çalakiyeke şoreşgerî ya ji sê aliyan ve bi serkeftî hate lidarxistin û bi cesareteke mezin û ruhê fedaî 42 dagirker hatine cezakirin û wiha domand: "Di serî de em hemû şehîdên xwe di şexsê rêheval Adar, Heqî, Medya, Amed, Binevş û Baran de ku pêşengiya van operasyonên şoreşgerî yên serkeftî kirin, bi fedekarî li çûn ser dijmin, li ser bidestxistina encamên diyarker, em hemû şehîdên xwe bi rêzdarî û minet bi bîr tînin. Ji ber vê serkefttinê em hemû fermandar û şervanên ku tevlî Pêngava Şoreşgerî ya Cenga Xabûrê ya Şehîd Savaş Maraş bûne û ked dane, pîroz dikin."

NPG'ê da xuyakirin ku van operasyonên şoreşgerî yên serkeftî yên ku we pêk anîn derbeke giran li planên dagirkeriyê û hesabên desthilatdariyê yên rejîma faşîst a AKP-MHP'ê xistin û wiha got: "Her çendî bi rêya medyaya şerê taybet hewl dan derba ku xwarine veşêrin û van operasyonên şoreşgerî weke kiryarên asayî nîşan bidin jî, şefên şerê taybet xwe gihandin sînor û Tayyîp Erdogan û Hulusî Akar bi xwe jî hewl dan ku hêzên dagirker ên ku moral û motîvasyona wan bû, bicivînin û xwestin bi dîmên erzan û nûçeyên serkeftinên sixte raya giştî bixapînin. Ev rastî jî têra xwe dike ku mirov fêm bike ku van operasyonên şoreşgerî yên ku 59



dagirker hatin cezakirin, derbek çawa li rejîma faşîst xistin" Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel ( NPG) diyar kir ku ev asta çalakî û performansa ku ew derbasî pêvajoya zivistanê dibin, wê moral, motîvasyon û kombûneke girîng di hemû hêzên wan de biafirîne û bibe wesîleya amadekirina wan ji bo erkên sala bê.

# Şêniyên Dêrikê piştgirî da helwesta Rêber Ocalan

**Bi sedan şêniyên navçeya Dêrikê piştgirî da helwesta Rêber Abdullah Ocalan a redkirina hevdîtina bi CPT`yê re.**

Ji bo piştgiriya ji helwesta rêber Abdullah Ocalan re ya redkirina hevdîtina bi CPT`yê re, şêniyên navçeya Dêrikê ya kantona Qamişloyê meşek li dar xist.

Meşê li Qada Azadî dest pê kir û di nava kolanên sereke yên navçeyê geriya. Di meşê de dirûşmên silavkirina berxwedana rêber Abdullah Ocalan hatin berzkirin û posterên wî hatin hildan.



tina me û yekitiya me nîşaneya îrade û israra me ya têkbirina hemû komployên dewleta Tirk û komploya li dijî rêber Ocalan e."

Wesfiye Mûrad diyar kir ku Komploya Navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan li dijî tevahî pêkhate; Kurd, Ereb û Suryan e. Her wiha piştgiriya xwe bi helwesta



Meş li qada sûka navendî rawestiya. Li vir ji bo şehîdên têkoşîna azadiyê deqeyekê rêz hat girtin. Piştre endama rêveber a Kongra Star a Dêrikê Wesfiye Mûrad bal kişand ser hevgirtina pêkhate û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û got: "Biêxistinbûyîna me, hevgirrêber Ocalan nîşan da û banga xwedîderketina li berxwedana rêber Ocalan heta mîsgeriya azadiya wî ya fîzîkî kir. Çalakî bi berzkirina dirûşmên "Bijî berxwedana rêber Ocalan" bi dawî bû. ***ANHA***

# Şêniyên Şedadê şehîd El Hemles spart axê

**Şehîd Kesar Casim El Hemles bi merasîmekê li goristana şehîdan a navçeya Şedadê hat veşartin.**

Şervanê QSD`ê Kesar Casim El Hemles 30`yê Mijdarê di encama êrişên dewleta Tirk a dagirker de li gundê Tirwaziyê yê Eyn Îsayê şehîd bûbû. Şêniyên navçeya Şedadê bi merasîmekê cenazeyê şehîd li goristana şehîdan a navçeyê spart axê.

Merasîmê bi toraneke leşkerî dest





pê kir. Piştre bi navê Meclisa Malbatên Şehîdan a Şedadê endama meclisê Îman El Ferec axivî û sersaxî da malbata şehîd.

Îman El Ferec bal kişand ser êrişên dewleta Tirk a dagirker û wiha axivî: "Şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li hemberî rêxistina herî tundraw sekinîn û bi ser ketin, îro jî li hemberî dewleta Tirk a dagirker a ku bi balafiran êriş dike û komkujiyan pêk tîne, disekinin."

Ji fermandarên Meclisa Leşkerî ya Şedadê Hogir El Mela jî axivî,



soza şopandina rêya şehîdan heta avakirina jiyaneke azad û birûmet da.

El Mela bang li gelên herêmê kir ku piştgiriyê bidin QSD`ê û tev li refên wê bibin û got: "Sekna li hemberî dewleta Tirk a dagirker erka tevahî gelê herêmê ye."

Piştî axaftinan, hevserokê Meclisa Malbatên Şehîdan a Şedadê Elaa El Îbrahîm nasnameya şehîd xwend û radestî malbata wî kir. Cenazeyê şehîd Kesar El Hemles tevî dirûşm û tilîliyên dayikan hat veşartin. -***ANHA***

# Xwepêşandanên Rojhilatê Kurdistan û Îran didomin

**Navenda Nûçeyan**

**Ji bo piştgirîdayîna serhildana gelên Îranê, jinên Belûçistanê xwepêşandanek li dar xistin û dirûşmeya `JIN JIYAN AZADÎ` bi yek dengî avêtin.**

Bi qetilkirina keça Kurd Jîna Emînî ya 22 salî, li tevayiya bajarên Rojhilatê Kurdistanê û gelek bajarên Îranê agirê serhildanê vêket û ev serhildan heta roja îro jî bi awayekî berfireh dewam dikin. Rêjîma Îranê jî li hemberî xwepêşandanên gel xwe negire û li dijî xwepêşandanan kuştin, şidet û binçavkirinê dike.

Li eyaleta Sîstan-Belûçistan ji bo piştgirîdayîna serhildana gelên Îranê, jinan xwepêşandanek lidar xistin .

Li gorî dîmenên ku li torên civakî belav bûne, bi dehan jinên ku cil û bergên Belûcî li xwe kirine li Sîstan-Belûcistanê, pankartên bi nivîsa "Jin Jiyan Azadî" li ser nivîsandî, ji bo piştgiriya serhildana gel bilind kirine.

Bi destpêkirina serhildana gel a ku piştî kuştina jina ciwan a Kurd Jîna Emînî ji aliyê polîsên exlaq ve derket, li Sîstan-Belûçistanê nêzî 120 kes hatin qetilkirin.

Di berdewamiya serhildanê de



bi dehan xwepêşander li gelek bajaran daketin qadan û dirûşmên li dijî rejîmê avêtin.

Li gorî agahiyên ku hatine belavkirin, hêzên ewlehiyê bi guleyan êrîşî xwepêşanderan kirine û gaza rondikrêj jî ji bo belavkirina xwepêşanderan bi kar anîn.

# ’PKK hêviya gelên azadîxwaz e’

Welatiyê Efrînê yê bi Mihemed Elî diyar kir ku PKK li ser xeta Şehîdan meşiya, bi têkoşîna ku daye û bi geşedanên ku afirandiye, ne tenê ji bo gelê Kurdistanê, ji bo gelên Rojhilata Navîn û jinên cîhanê bûye hêviya azadiyê.

**Zana Roj/ Şehba**

Şaristaniya jiyana azad bi fikrên Rêber Abdullah Ocalan, di demezrandina PKK’ê hat temsîl kirin. PKK bi armanca têkbirina koledarî û dagirkeriyê, ji destpêka avabûna xwe ve dest bi têkoşînê kir. Herwiha ji bo bidestxistina mafê gelê Kurd ku bi destê dagirker û dijminên dîrokî yên gelê Kurd hatibûn tunekirin, hat avakirin. Li ser bingeha aşîtî û azadiya gelan xwe rêxistin kir û bi wê mabestê ber bi meşa azadî û têkoşînê ve meşiyan. PKK ji 50 salî ve û heyanî vê rojê, berxwedaneke bêhempa dide meşand û derbên giran li dagirkeran dide. Bi 10’ê salane ku dagirkeriya Tirk û tevayiya hêzên ku destekê didinê, hewil didin ku Tevgera Azadiyê tesfiye bikin, lê nikarin. Bi hezara ji Kurdên welatparêz di nava vê tevgerê de cih girtin û bûn mîrasê fikirê Rêber Ocalan.

Welatiyê Efrînê yê bi navê Mihemed Elî ku Tevgera Azadiyê ji nêz ve nas dike û ji ciwantiya xwe ve û heta vê kêliyê ji bo gelê xwe xebatê dimeşîne, ji me re axivî û diyar kir ku Tevgera Azadiyê bi têkoşîna xwe ya azadiyê wê gelên Rojhilata Navîn ji tarîtiyê derxîne û wan ber bi ronahiya azadiyê ve bibe.

**’PKK partiya ku nayê têkbirin’**

Mihemed Elî 44’emîn salvegera



avabûna PKK li gelê Kurd pîroz kir û wiha got: “Fikrê Rêber Ocalan ji bo avakirina partiyeke bi vî mezinbûyînê pir cuda û kur bû, lewra ev tevger ji xeta azadiyê û têkoşînê derneket, yekemîn tevgerek Kurdî ku bi îdeolojiyek xurt û bi analîzên dem dirêj û li gor demê xwe bi rêxistin kir ji ber wê jî ev partî nehat têkçûn. Li ser xeta Şehîdan meşiya, bi têkoşîna ku daye û bi geşedanên ku afirandiye, ne tenê ji bo gelê Kurdistanê, ji bo gelên Rojhilata Navîn û gelên bindest û jinên cîhanê bûye hêviya azadiyê. “

**’Bi heqîqeta xwe bû hêviya gelan’**

Mihemed Elî da xuyakirin ku PKK bi rastiya xwe karî hemû bend derbas bikira û hêviya vejîna jiyana azad da afirandin û wiha domand: “PKK bi rastiya xwe a têkoşîn û berxwedaniyê ku ji bo rizgarkirina xaka Kurdistanê, karîbû bi vê rastiya xwe bi milyonan Kurd û mirovên ji pêkhatiyên din jî bi



xwe ve bide girêdan. Di heman demê de di oxira serkeftina vê têkoşînê de bi hezaran ciwanên Kurd û yên azadîxwez bi lêgerîna jiyana azad herikîn nava qadên leşkerî û siyasî, lewra PKK bi hebûn û rastiya xwe ji bo gelê Kurd bû hêviya jiyana azad û tunekarê dagirkeriyê. Tevgera Azadiyê bi têkoşîna xwe ya azadiyê wê gelê Kurd û tevayiya gelên Rojhilata Navîn ji tarîtiyê derxîne û wan ber bi ronahiya azadiyê ve bibe.”

**’Şoreşa Rojava mîrasê Tevgera Azadiyê ye’**

Mihemed Elî da zanîn ku destkeftiyên ku gelê Kurd di Rojhilata Navîn de bi dest xistine bûye armanca dewleta Tirk a dagirker lewra bi her awayî dixwaze şoreşa Rojava têk bibe û wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Serkeftinên ku di herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hatine bidestxistin, mîrasê hêz û fikira Partiya Karkerên Kurdistan e, ji ber vê yekê jî dijminê gelê Kurd dewleta Tirk a dagirker ev bû 10 sal in ji bo têkbirina destkeftiyên vê şoreşê bi hemû hêz û pilanên xwe êrîşê gel û herêmê dike, lê îradeya gerîlayên Kurdistan û berxwedaniya ku ji aliyê gel ve tê raber kirin, ji dijmin re îsbat kiriye ku ev gel bi êrîş û hovîtiya wan nayên tune kirin”.

# ‘Dewleta Tirk, ne bi tenê herêmê lê dixwaze Sûriyeyê gişî bixe destên xwe’

**Hevseroka Meclîsa Rêvebir a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Bêrîvan Xalid diyar kir ku divê cîhan bertekên xwe nîşanî êrîşên dewleta Tirk a dagirker bide û got: “Dewleta Tirk, ne bi tenê herêmê lê dixwaze Sûriyeyê bixe destên xwe.”**

Hevseroka Meclîsa Rêvebir a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Bêrîvan Xalid, li ser êrîşên hewayî yên ku dewleta Tirk şeva 19’ê Mijdarê li ser Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dan destpêkirin, axivî.

**’Êrîş rojekê jî nesekinîne’**

Xalid diyar kir ku ji Şoreşa Rojava û vir ve, dewleta Tirk êrîşê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dike û wiha got: “Rojek jî êrîşên dewleta Tirk ên bi ser herêmê nesekinîne. Di encama êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê de Efrîn, Girê Spî, Serêkaniyê, Cerablus, Bab û Ezaz hatin dagirkirin. Bi êrîşên ku dewam dikin dixwazin berfirehtir bikin. Mixabin meha Mijdarê de careke din dewleta Tirk li xwarina gefan li herêma me dewam dike.”

**’Dixwazin herêmê ji mirovan xalî bikin’**

Xalid bal kişand ser sûcên şer ên dewleta Tirk û wiha pê de çû: “Dewleta Tirk, bi êrîşên niha û êrîşên berê, gelek sûcên şer kirin. Êrîşê sivîlan û binesaziyan hat kirin. Dewleta Tirk û çeteyên wê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, sûcê şer dikin. Her kes dizane ku wê ev êrîş bibin sedema krîza mirovî. Polîtîkaya qirkirina xelkê herêmê tê birêvebirin. Bi van êrîşan dixwazin ku çavên gelê me bitirsînin da ku herêm ji mirovan xalî bibe.”

**’Bertekên li dijî komkujiya Dêrikê bê bandor bûn’**

Xalid bal kişand bi ser bêdengiya hêzên navneteweyî û wiha dirêjî da axaftinên xwe: “Bertekên li dijî komkujiya Dêrikê bê bandor bûn. Li herêmê ne bi tenê dewleta Tirk êrîşê me kir. Em bi rû bi rûyê hovîtiya DAÎŞ’ê jî bûn. Me herêm û cîhan ji belaya DAÎŞ’ê rizgar kirin. Xelkên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, herêm ji DAÎŞ’ê




parast û cîhan jî ji terorê paqij kir. Yên ku li dijî DAÎŞ’ê têkoşiyan, îro rû bi rûyê terora dewleta Tirk û DAÎŞ’ê ne, lê cîhan hêj dengê xwe nake. Bi deh hezaran kes ji bo cîhanê û herêmê ji terorê rizgar bikin, canê xwe feda kirin. Tevî ewqas fedakariyê kes dengê xwe nake.”

**’Bi tenê gelê me li herêmê xwedî derket’**

Xalid îşaret bi bertekên xelkên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yên li dijî êrîşan kir û ev tişt gotin: “Yên ku xwedî li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê derketin, bi tenê gel in. Gelê me van êrîşan qebûl nake. Gelên Kurd, Ereb, Tirkmen, Suryan, Ermen û Çerkez ji dema Şoreşa Rojava û vir ve xwedî helwest in, di soza parastina herêmê de bi israr û biryar in. Me Rêveberiya Xweser jî helwesta xwe eşkere kir. Em destûr nadin ku kes dest dirêjê destkeftiyên şehîdên me û Şoreşa Rojava-Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bike. Em ê Şoreşa Rojava bibin serî û wê û Şoreşa Rojava bibe modelek ji bo Sûriyeyê.”

**’Em ê êrîşan pûç bikin’**

Bêrîvan Xalid bang li xelkên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir li dora Rêveberiya Xweser kom bibin û got: “Em ê bi hev re van êrîşan pûç bikin. Em destkeftiyên şehîdên xwe, ne ji dewleta Tirk re ne jî terora DAÎŞ’ê re nahêlin.”

Hevseroka Meclîsa Rêvebir a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Bêrîvan Xalid, bang li civaka navneteweyî kir û wiha dawî li axavtina xwe anî: “Cîhan divê xwedî li Rojava derkeve û bi helwestekê li ber êrîşan rabibe. Dewleta Tirk ne bi tenê herêmê, dixwaze ku Sûriyeyê bixe destên xwe. Cîhan divê êdî dengê xwe ji dewleta Tirk re bike.”

***ANF***



## Siyaseta dij-Kurd a dewleta Tirk

**Farûk SAKIK**

Di êrişên dewleta Tirk a dagirker de gelek kod hatin tevlihev kirin. Herkesî li gorî xwe hin analîz û şîrove kirin. Di serdema îro de analîzên tu kesî rast dernayên. Ji bo ji berê de texmînkirina
siyaseta Rojhjilata Navîn, îhtimalek wek girtina toto-lotoyê ye. Ev demek dirêj e me ji tu kesî nebihîst ku bivêje “min gotibû”.
Dibejin xeyalên Erdogan yên Neo-Osmanî hene, ji bo pêk bîne êriş dike. Heger li du vî xeyalî be, sînorê xeyalê wî di nav axa gelek dewletan de derbas dibe, çima êrişî wan dewletan nake.
Dibêjin Erdogan li ber têkçûnêye û ji bo bandore li dengê nîjadperestan bike êrişî Rojava dike. Komkujiya Taqsîm kir hincet ku êrişî Rojava bike. Na..pêdiviya wî bi hincetek hîç tuneye. Bê sedem dikare êrîşî Kurdistanê bike.
Kodên Teqîna Taksîmê yek bi yek zelal dibin. Her çiqas ji Qesra Spî di daxuyaniyek de hatibe gotin ku hên jî ew teqîn zelal nebûye, lê hemû agahî di destê îstixbarata wan de hene û dibe ku van agahiyan bi raya giştî re par veke da ku nebe sedema teqîn û komkujiyên nû. Ez baş dizanim ku wê ji bo berjewendiyên xwe ji bo li hemberî Tirkiyê wek qozek bi kar bîne niha li koşeyek hiştiye. Ev li dera hanê kodên hilbijartina jî negirt. Ji bo hin kesên ji xwe re dibêjin hunermend wek Efrînê li kêleka wan cîh nagire.
Sedemeke din a êrişên dagirkeriyê; dixwazê li hemberî gerîlayên kurdan têkçûna xwe ya van du salên dawî, bi serkeftineke sexte, bi fotografeke sexte bide veşartin. Di vî şîroveyê de min jî texmînek ku nerastbû kir. Dewleta Tirk a dagirker bixwaze hertim dikare serkeftinek sexte biafirîne.
Mînakek em bidin di sala 2016’an de li Tirkiyê darbeyek çêdibû destûr da û şopand. Êvara darbeyê Erdogan di kanalek televîzyonê de fotografê qehremaniyê belav kir. Ev çend sala li wê axê bû dîktator. Li dijî zilimkariya wî kê derxist, wek dijmin, terorîst û ajanê dewletên dijminan îlan kir û ew avêtin zîndanan.
Wek vê darbeyê, wî dizanibû ku wê li Taksîmê teqînê pêk were. Ev agahî di dest wan de hebû. Dema ku Erdogan îşaretên bi rejima Şamê re da, hin rêxistin û komên çete li dijî vê yekê derketin. Erdogan ji wan re El Nûsra alternatif nîşan da. Wan komên çete jî li Taksîmê bi teqînek wê alternatîfa xwe nîşan bidana. Istixbaratê got em ê jî vê teqînê bikin hincet û bikevin Rojava. Û wisa kirin. Dema ku teqîn pêk hat Erdogan û Soylu plana xwe xistin meriyetê.
Em derbasî texmînên berî êrişên 19’ê mijdarê bibin. Digotin Amerîka û Rûsya wê destûra hewayî nedin. Digotin, şerê Ûkranya heye, Rûsya destûr bide jî wê Amerîka li dijî derkeve. Nebû. Gotin, Rûsya li ser nave rejima Şamê wê destûr nede ku dîsa axa wan were dagirkirin. Nebû. Rûsya, Amerîka û Şam bihevre destûr dane dagirkeriya Tirkiyê.
Herkesî digot, Kobanê wijdana mirovahiyê û navenda têkoşîna li dijî DAIŞ’ê ye. Di peymana Enqerê ya di sala 2019’an de hatî parastin. Di peymanê de ji Tirkiyê re dihat gotin; bi ti awayî nekevin Kobanê. Lê ji niha de berî ku êrişên bejayê dest pê bikin, bajarok û gundên Kobanê yek bi yek têne bombekirin. Dijmin dixwaze bi van topbaranan kaosê çêke û da ku gel ji herêmê vekişe, ew jî çeteyan xwe bîne li van herêman bi cîh bike.
Lê di yek tiştî de em tu caran di texmînên xwe de xelet derneketin. Dewleta Tirk kurdan wek dijmin dibîne û dixwaze tune bike. Ev rast e.



# ’Li hemberî êrîşan em ê asta têkoşînê mezin bikin’

Endamê rûsipiyên eşîran yên herêma Efrînê Hecî Mistefa diyar kir ku êrîşen dewleta Tirk ya dagirker tevayiya gelên herêmê dike armanc û got, li hemberî êrîş û planên qirkirina gelan emê asta têkoşînê mezin bikin û dagirkeran têk bibin.

**Navenda Nûçeyan/ Şehba**

Dewleta Tirk ya dagirker di 19’ê Mijdarê de êrîşî herêmên seranserî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir, di van êrîşan de bi awayekî plankirî navendên betrolê, kargeha gazê, embarên genim, dibistan û herî dawî jî mezgeft hatin hedef girtin. Di encamê de bi dehan wwelatî birîndar û şehîd bûn, gargeha gazê û navendên sotemeniyê ji kar derketin, hin dibistan û gelek malê welatiyan hatin rûxandin. Li hember van pilan û êrîşan, helwesta hêzên QSD û tavahî gelêN herêmê zelal derket holê. Gelên herêmê bi biryadarî diyar kirin ku li hemberî her êrîşekî ew ê bi hemû hêza xwe persîvdayînên xurt bidin, lewra bi hezaran gelê herêmê ji Şehba ta Dêrîkê gel li pişta hêza xwe daketin qadan.

Derbarê êrîşên dewleta Tirk ya dagirker yên ser herêmê ku rojane dewam dikin, Hecî Mistefa ku yek ji rûsipiyên eşîran yên herêma Efrînê ye ji rojnameya me re axivî.

**’Erdogan jêdara tevlihevî û terorê ye’**

Hecî Mistefa diyar kir ku dagirkeriya Tirkiyê dixwaze kebmberkê ji çeteyên radîkal yên Islamî li ser axa Sûriyê ava bike û wiha got: “Dewleta Tirk a dagirker ji destpêka aloziya Sûriyê



ve, bi her awayî destrdirêjî li xaka Sûriyê kir û alozî kurtir kir. Dewleta Tirk ya dagirker bi avakirina komên çeteye û destikdayîna çeteyên DAIŞ’ê ji her kesî re isbat kir ku hikumeta AKP-MHP jêdera tevlihevî û terorê di cîhanê de ye. Ji ber ku hêzên YPJ’ê û YPG’ê çeteyên DAIŞ’ê li ser axa Sûriyê têk birin, dagirkeriya Tirk dixwaze tola çeteyan rake û êrîşê herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike.dagirkerî di êrîşên dawî de bi awayekî eşkere êrşîşî kampa Holê kir û xwest çeteyan ji kampê derxîne. Kiryarên dewleta Tirk ya dagirker siyaseta wê ya destkdayîna çeteyan eşkere dike.”.

**’Ev êrîş tavahî pêkhateyên herêmê dike hedef’**

Hecî diyar kir ku êrîşên ku li ser herêmê tên kirin tavahî pêkhateyan dike armanc û wiha domand: “Dagirkerî bi salane şerê qirkirnê li ser Kurdan dide meşandin, di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ne tenê Kurd rastî van kiryaran tên, bi awayekî rasterast gelê Suryan, Ereb, Îzîdî, Çerkez û Turkmen jî, tavahî pêkhateyên ku jiyan dikin dibin hedef, di heman demê de di van êrîşên dawiyê de gelek



leşkerên Sûriyê jiyana xwe ji dest dan, li beramberî wê tu helwest ji aliyê hikumeta Şamê ve nehat nîşan dan, li ser vî esasî divê li hember van êrîşên hovane û suçên şer, hêzên navnetewî û herêmî bêdeng nemînin ”.

**’Em ê li hemberî êrîşan têkoşînê bilind bikin’**

Rûsipiyê Eşîran yên Efrînê Hecî Mihemed tekez kir ku wê li hember van kiryaran dev ji têkoşîn û berxwedaniyê bernedin û wiha got: “Ne ji Îro de, ji beriya 45 salan me biryara têkoşîn û bilindkirina asta berxwdaniyê daye, ev erka me ya welatparêziyê ye. Ji ber wê jî em piştgiriya hêzên QSD û Rêveberiya Xweser dikin, li ser wî esasî derveyî pilanên siyasî yên ku li ser me tên kirin û nêzîkatiyên navneteweyî û yên hikumeta Şamê bi taybet, me xeta xwe a hebûn û nebûnê li ser esasê li dijî dagirkeriyê şerkirin hilbijartiye, wê sekna me li hember pêvajoyê cidî û serbixwe be”.

## Ji Bakur û Rojhilatî Sûriyê Nameya Pêkve Jiyanê

**Idrîs Henan**




Pêvajoyek wisa ye ku her tişt serûbin hev bûye, ewqas kirîzên civakî, leşkerî, siyasî, çandî û exlaqî kûrtir kirine ku mirov dibêje qey veguheriye girêka kor û êdî ji hev û din dernakeve. Roj bi roj, ev tabloya han zelaltir û baştir dibe. Sîstemên serdest ku bûne navenda kaosê, hewl didin vê rewşê bi şîdet û şerên dersînor derbas bikin. Fena miriyên kevir li sêrê wan dikeve lê hatiye ku hebûna wan, kirîz û kaos bi xwe ye. Çendîn dixwazin li ser vê yekê bigirin û zirşêweyek din li xwe bar bikin, lê binyada çêbûna wan vê yekê red dike û ji nû ve li ser kokên xwe yên zilm, zordarî û mêtingeriyê şîn dibin. Mirov tenê çavekî li biçimên wan bide, têrê dike ku rewşa heyî ya pergalê baş were fêmkirin.

Nûnerê kirîz û kaosa pergala serdest a cîhanî li Rojhilata Navîn û rojhilatê deryayê Spî, desthilatdariya faşîst a AKP – MHP ye. Desthilatek wisa ye ku bi rêya şer û bi sozên qirkirina Kurdan û bizavên şoreşgerî li herêmê xwe li ser lingan radigire. Di vê oxirê de jî, çi dahatû û derfetên dewletê û civakê hebin xerc dike. Lewre, tê dîtin welat gihaye kîjan keviya hilweşînê. Çendîn bi rêbazên destserkirina serdestiyan encam nagire jî, berê xwe dide sûcên şer û hewl dide bi vî awayî encaman bigire.

Di armanca hemû reftar û kiryarên Erdogan de, geşkirina rabirduya wî ya hilbijartinan heye. Li gorî wî, tenê şerekî dersînor li dijî Kurdan dê wî rizgar bike!. Ji ber vê jî em dibînin bi hemahengiya bi mêtingerên dîtir re, koordîneya qirkirina Kurdan dike û hewl dide hêza dînamîk a li herêmê, di kesayeta pêşengtiya Kurd de têk bibe. Lewre; ne tesadûf e ku faşîst Receb Tayîp Erdogan çawa perdeya li ser hemleya xwe ya qirkirina Kurd hildide, wezîrê karê hundirîn ê Îranê rasterast qala koordîneya di navbera herdu rejîman de dike. Li Sûriyê jî rejîma heyî bi perpektîfên Rûsya û Îranê û hewcedariyên desthilatdariyê, dest bi dorpêça herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike û gopalan li defa nijadperest, qirker û faşîzane ya Erdogan dide. Ji bona vê jî, demek dirêj e di nav hewla bêdengkirina hawîrdorê de ye. Lê xuyaye berjewendiyên ceostratejîk ên welatên herêmê, rojava û hegemoniya navendî bi rêderketinên Erdogan re li hev nakin. Aliyek din ê girîng jî ew e ku; karakterê Tevgera Azadiya Kurd a pêşengtiya têkoşîna gelan li ser bingehên wekheviyê dike, êdî li herêmê bi kok bûye û tu hêzek nikare ji nav bibe. Di vê derbarê de, çendîn hewldan hatibin kirin jî, bê encam mane. Di bingeh de, sedema sereke ev e. Nikarin li ber têkoşîna gelan a li derveyî sînorên dewletdarî û navenda hegemoniyê mezin dibe, xwe rabigirin. Lewre; êrişên bêserûber li ser nirx, deskeftî û lîderan dikin. Ji îzoleya li Îmraliyê bigire û heya dorpêç û êrişa li ser bajarên Bakru û Rojhilatê Sûriyê were, hemû jî di coka yek konsepta pêvajoya serûbinbûyî de diherike. Hemû aliyên li ser erdê xwedî yek berjewendiya objektîf in.

Berxwedana îro li Zap, Metîna û Avaşînê têye raberkirin, têgehên klasîk ên li ser teknelojiya têkneçûyî çirandin. Helwesta gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û civata li dora îradeya xweparastinê, nameya rasteras a israra li ser senteza pêkve jiyan û berxwedanê ye.



## Durûtiya DYE û Rûsyayê

**Ahmet AKTAŞ**

Erê weke tê xuyakirin û ji xwe li ber çava ye ku, dewleta yekemîn a qirker û mêtinger a li ser Kurdistanê desthilatiyê dide meşandin dewleta Tirka ye.
Bêgûman vê xwînxwariyê li ser gelê Kurdistanê, ne bi tenê pêktîne. Hema pêşî vî karê qirêj, bi her 3 dewletên mêtingerên din Îran, Iraq û Suriyeyê re birêve dibin.
Her wiha, hêza herî bi kêrhatî ji bo xizmeta van dewletên dujminên mirovahiyê, xiyaneta welatê me ye û serkêş jî malbata Berzanî ye.
Mirov dikare bibêje, ev xiyanet, ji çekên kîmyewî û hemû cûre çekên dewletan xerabtir, zerar û ziyanê dide têkoşîna doza gelê Kurdistanê.
Lê divê hêzên herî mezin yên cîhanê ku di nava vê plana gemar û xwînrij de ne, neyên jibîr kirin. Ji ber ku gelek caran tên jibîrkirin. Serê van hêzên hegemon yên cîhanî DYE û Rûsya dikişîne. Divê van dewletan, êdî ji berê xurtir werin naskirin.
Bi taybetî van her du dewletan, nêzî sed salan e ku vê sîyaseta dijî berjewendên gelan, bi hostayî û kotekî didin meşandin.
Erê, her çendîn di vê serdemê de, ev siyasetên wan ên malxerab/malwêran pir hatine aşkerekirin û dijberiya wan mezin bûbin jî, lê dest ji ew hewldanên xwe yên kevnar yên xapandinê bernadin.
Heta ku karibin rayagiştî cîhanî dixapînin, lê dema rûyên wan ên reş derdikevin holê, dest davêjin darê zorê.
Belê ji bo van dewletan jî, çeka herî bi kêrhatî dîsa xiyanet e, ku temenê serweriya wan jî, ya li ser welatê me dirêj dike ev xiyanet e.
DYE, Hewlêr ji xwe re, him kiriye bingehek navenda desthilatiya xwe ya Rojhilata Navîn û him a Kurdistanê.
Rusya jî, hema bi heman naverokê Şam ji xwe re kiriye navend.
Ji bo ku wî rûyê xwe yê bêxêr veşêrin, dîsa wan gotinên xwe yên kevnar, ji bo xapandinê bikartînin.
Herî dawî, fermandarê leşkeriya Rûsya yê li Sûriyeyê General Çayko û Berdevkê DYEyê Kirby, ji aliyekî ve QSDê weke dost/hevalbendê xwe nîşan didin, ji aliyê din ve(yê giring vira ye), dewleta Tirk mafdar dibînin(xwedê giravî parastina ewlekariya dewleta xwe dikin).
Derewa wan a mirova pir têşîne ev e; “Ji bo em êrîşên dewleta Tirkan li ser we bidin rawestandin û em wan iqna bikin, divê hûn ji sînor 30 km dûr bikevin”! Ev tê wateya; radestkirina hemû Rojava, ji faşîzma Receb û Bahçeli re!
Wexta ku xeter ji bo wan hebe, iqna lazim nake, hema yekser dikarin dewleta Tirk bidin rawestandin(bi fermanekê)!
Ji ber ku mînakên van di jiyanê de hatin dîtin.
Mînakên van derewên wan en ji bo gelê me jî, li Efrînê, Serêkaniyê, Girêspî û hwd, me dîti ne. Ji xwe dagirkirina Cerablûsê, Ezazê, Babê û hwd, hatine jibîrkirin. Dixwazin bi vê siyaseta malxerab, hemû destkeftiyên gelê Kurdistanê jê bistînin.
Îca, ‘diz û xwediyê malê bi hevdu hesiya ne’, divê aşkere ev durûtî, van fêlbazî û lîstokên bê exlaqî ji xwedanên wan re, yekser werin gotin. Her wiha divê gelê Kurdistanê jî, li goreyî van xeteran, xwe li ser derfetên heyî amade bike.